

## iki dil bir bavul : kolonî û neçarî

Mirov bi dîmenên filîmê « iki dil bir bavul » re, gellekî li ber neçariya wan zarokan lê herweha ya mamosteyê wan jî dikeve. Derhênerên filîm, Orhan Eskinoy û Ozgur Dogan baş dizanin bê behsa çî dikin. Ji ber wê jî, heta dawiyê, karê xwe bi baldarî kirine, da ku filîm ji armanca xwe bi dûr nekeve.

Lehengê filîm, Emre, di eslê xwe de, mamosteyekî paqij û îdealîst û bi tenê ye ku ji cîhaneke din, ji bajarê tirk yê Denizliyê hatiye gundekî kurd yê Rihayê. Mamoste turk e û bi zimanê kurdî nizane. Zarok jî, ji bilî çendakên ku li dibistanê fêr bûne, bi turkî nizanin. Çîroka filîm ew e ka gelo peywendiya mamoste û wî gundî û wan zarokan û wî zimanî dê çî be û ji hêla din ve jî helwêsta gundiyan û zarokan dê li hember wî mamosteyî û wî zimanê nû dê çî be.

Filîm ne fiksiyonek e. Weke dokumenterekê hatiye kişandin û têra xwe realîst e. Mamoste mamosteyekî rast e û nuh tayina wî derketiye, zarok jî zarokên rast in. Senaryoyeke berbiçav diyar nabe, lê bêguman, di serê derhêneran de fikrek heye û wan ev fikra xwe ji mamostê re negotiye. Ji ber wê, rastî bi awayê herî rût û bêyî makyaj hatiye dayin. Cîhên ku ji bo kamerayê hatine hilbijartin, ber dîwaran, ji dûr ve, li pişt beştan, yanî dûrî bûyeran, wê hîssê dide mirov ku mirov di eslê xwe de ne li wira ye, lê belê mirov hertiştî dibîne, yanî « mirov bi dizî dibîne » û dibe şahid. Gava ku Zulkuf firavînê dixwe, di nava me û wî de beştekek heye. Gava ku dêya wî wî ji bo dibistanê amade dike, em ji dûr ve dibînin. Gava ku dêya Rojdayê bi wî şehê jidiyayî pore wê yê neşuştî şeh dike, em kameraya Yilmaz Guney dibînin, gava ku zarok li hewşa dibistanê dilîzin, Emreyê ku li ber dîwarekî li sert û tikan rûniştiye ji gellekî dûr ve tê dîtîn û tînetiya wî diyar dibe. Filîm jiyana wî gundî ya bi mamosteyê nû re tomar dike û weke xwe dide me. Derhêner jî ji xwe dixwazin wê hîssê bi mirov re çêbikin û gellekî jî bi ser dikevin. Ji ber wê ye ku kes ji xwe napirse gelo çima em odeya mamoste ya razanê û televizyona wî nabînin, digel ku dengê televizyonê tê me. Lê belê, li mala Îbrahîmê bavê keçika ku tiliya wê jêbûye, em televizyonê dibînin. Lewre detayên dorhêla bûyera sereke ji xwe bi vir de û wê de ber bi çavên mirov dikevin. Filîm dixwaze Emre û wan zarokan bîne ber hev.

Emreyê mamosteyekî neçar e, lewre li gundekî weha ku ava wî kêr e û elektrîka wî nîne, pênc sinifên ku hin ji wan bi tirkî dizanin û hin ji wan nizanin û sinifên yekem qet bi tirkî nizanin, hewl dide ku mamostetiyê bike. Bê guman, di rewşeke weha de stratejiya mamostetiyê mecbûr e ku xwe adapteyî rewşê

bike. Ev zarok hê bi tirkî nizanin, ka gelo ew ê çawa fêrî xwendin û nivîsandinê û tew matematîkê bibin. Ji ber wê Mamoste Emre tercîha xwe dike û bi telefonê stratejiya xwe ji dêya xwe re dibêje :

*« Ev zarok bi tirkî nizanin. Ji ber wê nikarin fêrî matematîk û Hayat Bilgisi bibin. Îsal, bi kêmanî, ez ê wan fêrî tirkî bikim û saleke din jî ez ê tiştên din nîşanî wan bidim ».*

Dêya Emre di filîm de weke alaveke baş hatiye bikaranîn, lewre bi xêra axavtinên bi dêyê re em Emre û reaksiyonên wî yên li hember vê jiyana wî ya nû û van zarokên ku ji wî fahm nakin û vî zimanê ku ew pê nizane dibînin. Ew bi tenê ye, li hember gellek dijwariyan û di nava zivistaneke ecêb de... Kes nayê alîkariya wî, Emre bi tena serê xwe hewl dide ku deriyên şaristaniyê li ber zarokên kurd veke. Lê belê, gava ku zarok ji wî fam nakin û axir wan derdixe derve, Emre serê xwe dixwe nava herdu destên xwe û digirî.

Dilê mirov bi Emre dişewite. Ji ber ku ne sûcê wî ye. Ji wî re weha hatiye gotin. *« Divê ew zarok fêrî tirkî bibin, fêrî xwendin û nivîsandinê bibin, bibin însan. »* Di eslê xwe de karê ku Emre dike baş e. Başbûn an xirabbûna wî karê wî li gora Kurdekî û li gora Tirkekî dikare were guhertin. Ji ber wê, filîm « bi zîrekî » hatiye kişandin. Hewl nedaye ku kesî xirab bike. Mudaxale nehatiye kirin, Emre kî be, di filîm de jî ew e. Ji ber wê ye ku roja yekem « Andimiz » nîşanî zarokan dide ku di rêzika yekem de dibêje « Turkum (Ez tirk im) » û di rêzika dawîn de jî dibêje « Ne Mutlu Turkum Diyene (Xwezî bi dilê wî kesî ku ji xwe re dibêje tirk) ».

Zarok ji wî fahm nakin. Kurd in, lê dibêjin « Ez tirk im » ; ev jî ne xema wan e. Di vê peywendiyê de yên ku « naîf » û saf in, zarok in, ne Emre ye. Lê belê, Emre heta dawîn jî nikare wan peyvan bi wan bide fahmkirin. Yanî, Emre ji xwe re dibêje. Lê belê Emre dewlet e. Yek bi yek diçe malan û li zarokan digerre. Dipirse ka gelo zarok çima nayên mektebê. Kesek jî nabêje ku mekteb ji wan re ne lazim e. Di vira de, hebûna mamosteyê dewletê û dibistana dewletê, weke hebûna serdestan diyar dibe. Zarok diçin dibistanê ji ber ku serdest weha dixwazin. Yanî, mirov dibêje qey di vî filîmê de bi tenê peywendiya zimanan û mamoste û şagirtên wî yên zimanên cuda heye, lê di eslê xwe de her yek ji van endamên filîm fikreke din temam dikan.

Xapandineke din jî heye ku xwendineke cuda pêwîst dike. Mirov dibêje qey serlehengê filîm Mamoste Emre ye, lê hê di dîmena wî ya yekem de mirov fahm dike ku di eslê xwe di vî filîmê de serleheng Zulkuf e. Ji ber ku mamoste çi ji wî

bipirse jî bersivê nade wî. Lewre Zulkuf bi zimanê mamoste nizane. Gava ku sala perwerdehiyê bi dawî dibe û mamoste pirsên gellekî normal ji wî dike jî, Zulkuf bi tenê dibêje "hayir" (na). Di eslê xwe ew *na*'ya Zulkuf ne bersiva mamostê ye, lê belê « rastiya sîstema Tirkîyeyê ya perwerdehiyê » ye. Lê ew « na », îşareteke din e jî : Zulkuf red dike. Malbata Zulkuf red dike. Ji ber wê ye ku, weke ku derhêner di hevpeyvîna xwe de dibêjin, salek bi şûn de Zulkuf êdî dev ji mektebê berdide û diçe pembo, yanî dibe weke « her kesî ». Lê belê, Emre jî red dike. Nahêle ku zarok bi kurdî bipeyivin û ew jî xwe fêr nake û ji jor ve li zimanê wan dinere. Ji ber wê ye ku ji dê û bavên wan re dibêje « zarok dibêjin *na*, ez bawer im ku ev *hayir* e. » Yanî, wî Zulkuf fêrî *hayir*'ê kiriye, lê Zulkuf jî bi zorê ew fêrî *na*'yê kiriye.

Emre di filîm de pirsekê ji zarokan dike û dibêje « Hûn ji min fahm nakin, ez jî ji we fahm nakim. Îcar em ê çi bikin ? »

Herdu alî jî neçar in. Qedereke weha ye ne wan zarokan û ne jî Emre hilbijartiyê. Li ser wan hatiye ferzkirin. Lê belê, di filîm de sahneya ku rastiya bûyerê derdixe holê û perdeya safî û paqijiyê îdealîzma Emre radike ew e ku Emre ji ber ku zarokan peyveke bi kurdî li ser pirtûka xwe nivîsandiyê, zarokan ceza dike. Sê zarok li ber texteyê nivîsandinê, li ser lingekî disekin. Emre dest bi karê xwe yê kolonyalîstiyê dike.

Gava ku Emreyê paqij û mirovhez û xwezahez dixwaze darekê li hewşa dibistanê biçîne, zarok di nava xwe de bi kurdî dipeyivin. Emre ji wan re dibêje « Bi kurdî nepeyivin. Binerin, em ê ji hev bixeyidin ha ! »

Axir, Emre fahm dike ku ev mesele divê ji nava malê dest pê bike û dibistan bi tena serê xwe nikare bi ser bikeve. Kolonî divê bikeve heta naa malan jî. Hingê di civîna bi dê û bavên zarokan re de, ji wan dixwaze ku di meseleya zimanê tirkî de alîkariya wî bikin.

Di wê sahneyê de em sê rastiyên din jî dibînin.

- 1- Dewlet weke berxikan dê û bavên zarokan dide ser hev.
- 2- Jin bi tirkî nizanin. Ji ber wê, di nava mamoste û jinan de Îbrahîm wergêriyê dike.
- 3- Îbrahîm li ser navê gundiyan lêborînê ji mamostê dixwaze (lewre zarok bi tirkî nizanin).

Belê, neçarî... Ji ber vê neçariyê, şaristaniyeke weha anîn ji me re ku me ji bini ve şaristaniya xwe red kir. Lê, Xwedê kir ku hê jî Zulkuf hene ku dibêjin « na ».

Lewre, Zulkuf gava ku wê berdilka xwe ya şîn ji xwe dike, di ber xwe de dikene. Ji ber ku dizane ku êdî azad e. Ew berdilk temsîla koloniyên e.

Filîm, digel ku dokumenterek e û muzîk û lîstikan bi dîmenan tê de nîne jî, ji aliyê hissî ve jî gellekî xurt e û bandoreke weha li mirov dike ku demeke direj piştî bidawîbûna filîmê jî, mirov her li wan zarokan difikire. Orhan Eskikoy û Ozgur Dogan filîmekî weha çêkiriye ku dê hê demeke direj jî di bîra dîrokê de bimîne, lewre ew dîrok bi xwe ye. Lê di vê nivîsandina dîrokê de, kêmaniyek ber bi çav dibe : di "iki dil bir bavul" de, Emre bi zanebûnê û bi armanceke zelal û diyar tê wî gundî. Karê wî ew e. Mixabin kameraya vegotinê di vê bihevketin an jî nakokiya çandî-zimanî de bêtir nêzîkî mamosteyê ciwan e û ji hêla gundiyan û bi taybetî jî ji hêla zarokan ve pirr kêr ew jî di dîtin. Sedem jî ew e ku derhêner weke wî mamosteyî ji derve li bûyerê diniherin û ji xwe bi hatina wî re, kamera jî tê gundî. Gava ku rojekê heman çîrok berevajî bibe û ji hêla Kurdan ve lê biniherin, belkî em herdu hêlên çîrokê jî zelaltir bibînin. Xwezî psîkolojiya zarokan jî piçekî bihataya vegotin. Belkî bi wî awayî baştir bûya. Ji xwe kêmaniya herî belloq jî ew e.